Êdî bi êrîşên DAIŞê bo ser Kobanê û kiriyarên wê yên hovane li dijî Kurdan (bi taybet Kurdan) li gundên wan, kuştina zarok, jin û pîremêrên Kurdan û helwêsta aliyên opozisyonê ya xav û bê rewişt her tişt eşkere kir û da diyarkirin ku bê kî kultêrxur e û kî xwedî nerîn û bername ye bo Sûriyek nû. Xudan bername û program, heger em li gel wê bernameyê bin an em ne li gel wê bin lê mirov gerek nekeve gola xiyanet û bê rewiştiyê ew gola ku Hevpeymaniya Sûriyê xwe tê werkir û ifnka xwe ya Efleqî eşkere kir.

Kiryar û komkujiyên DAIŞê li dijî kurdên Sivîl piştî helmeta fireh ji aliyê hin xwe firoşên Ereban ku xwe wek pêşengên şoreşa Sûriyê hesab dikin ew hêzên şofînî eşkere kirin û her tişt bo miletê Sûriyê hat zelalkirin, ne tenê bo miletên Sûriyê belku bo civata navdewletî jî lewma ez matmayî nemam dema min nûçeya ku bêhtirên endamên Hevpeymaniya Sûriyê ji aliyê Amerîka ve wek Têror hatine qeydkirin û derbas bûna wan bo Amerîka hatiye qedexekirin.

Êdî ji pêkhateyên Rojavayê Kurdistanê re hatiye eşkerekirin ku kîjan alî bazarê bi xwîna wan dikin û kîjan alî xwedî piroje û mafxwaz in.

Di daxwaza pêkhateyên Rojavayê Kurdistanê de miletê Kurd li wî beşê Kurdistanê pêşengê xebat û hilgirê alaya demokratî û pêşketinê ye, lewma îro bêtir ji hemî deman erkê ser şanê hêzên Kurdî girantir dibe û tê xwestin ku mala kurdî bê serastkirin û li ser berjewndiyên miletê Kurd bighên yek tîfaq û rêkeftinê, ne tenê jibo pêkanîna mafên Kurdan lê belê ji ber ku bi pêkanîna mafê milêtê Kurd li wî beşê kurdistanî parstina mozayîka şaristaniya wê herêmê tê parastin û rêz ji mafê mirovan re tê girtin û rê li ber xwefîroş û şofînîyên ku bi şîr û ramanê Efleqiyan hatine xudîkirin tê girtin.

Zingilê Metirsiyê Lê Da

Ebdilselam Xoce



"Mirov nizane bê wê ji ku destpê bike !!"

Lê gelo sedem çi ne ku miletê Kurd hetanî ku şer neghê ber deriyê wî şiyar nabe.!?

Sedem çi ne ku tenê dema xwîna Kurdan bi destê dijmin tê rijandin em nû dilivin û li çareseriyan digerin?

ji destpêka şoreşa Sûriyê û her kesî dizanîbû ku ev agirê ku pêket wê ter û hişk bide ber xwe, tevgera Siyasî a Kurdî li Sûriyê berî her kesî xwe bi rêxistin kir ji bo ew karibe amade be bo her guhertineke ku wê ev şoreş bi xwe re bîne û komcivîna ku li Hilêlîkê hate lidarxistin yak ji wan komcivînên ku ji bo vê mijarê bû, di pey re gelek komcivîn hatin lidarxistin ji bo yekrêziya Kurdî çêbibe û sînorek ji perçebûna laşê tevgera Kurdî re bê dayîn, encûmen û komele û rêkeftin lidar ketin.

Hêzên Kurdistanê ên sereke ji destpêka şoreşa Sûriyê de bengewazî Kurdên Rojava kirin ku xwe bikin yek ta ku amade bin ,lê ew ramanên teng ên kesayetî û partîtî bûne rêgir ber hemû wan bengewaziyan, di vê mijarê de em naxwazin sedemên têkçûna wan rêkeftinan bidin xuyakirin bi qasî ku em dixwazin çareserîkî bibînin, ku em karibin bi bandor bin di parastina miletê xwe de û em bighên wê baweriyê ku dem qediya û şer hate ber derî û dem bûye dema hebûn û tunebûnê.

Vaye li Kobanî komkujî di derheqê gelê Kurd de têne kirin, şer derbasî bajarê Hisiça bûye, bê dilovanî rêxistina Da'iş a tundrew tawanan dike, kolanên bajarên Kurdan ji penaberan tije bûye, û em hîn mijûl in bi nakokiyên xwe.!!?.

ev demeke heft partiyên kurd ên ku ji dervî tevgera civaka demuqrat (Tev-Dem) in, û encûmena Kurd li Sûriyê (ENKS), bangewaziyê dikin ta ku karê lêvegera Siyasî û rêkeftina Dihokê bê ektîvkirin, û hemû nakokî û kêşeyên ku bûne sedem di ber ne çalakirina vê rêkeftinê bêne hilanîn, lê bersiva ku ji hin partiyên (ENKS), derket ewbû ku ev bangewazî pîlaneke û rêkeftina Dihokê bê şert û mercnayê ektîvkirin,û (Tev-Dem) bi tena serê xwe karan dike û ew sûcdarê ku kêşe û karesat têne serê gelê Kurd.

li vir hin pirs hene têne kirin? Heger em berdewam bin di gazin û xeyda partiyên Encûmena Kurdî de, û rijdbûna (Tev-Dem) ser kar û biryarên xwe de, wekû dibêjin wê "Hasil Bighê Mûsil", û wê bajar û bajarokên Kurdan li Rojavayê Kurdistanê bibe yarîgehek ji rêxistina Dewleta Islamî "Da'iş" re.

Di baweriya min de her tişt û xalên cihê gengeşê têne paşxistin ,çimkî wekû me di destpêkê de diyar kir ku dem bûye dema man û nemanê, û bangewaziya her heft partiyên lêvegera siyasî bangewaziyeke û daxwazeke kurdayetiyê ye, bo rê bê girtin berû pêşketinên rêxistina "Da'iş" ber bajarê Kurdan ve.

zingilê metirsiyê lê da, û pêwîst e ku bi lez rûniştinek bê kirin, bi amadebûna hemû partiyên Kurdî, û di bin siya Lêvegera Siyasî de hetanî ku pirojeyek demkî bê dayîn û rewşeke lihevkirinê di navbera hêzên Kurdî de çêbibe û bi hev re di riwê hemû aliyên ku hewl didin miletê Kurd pêpar bikin, ji encamên ku wê di paşeroja Sûriyê de bên kirin.

çimkî heger ev dûrbûn û tewankirina van partiyan ji hev re wê tu qezenc û sûd jê newê!!

Îro roj erk û stûbariyeke mezine, ku mirov li xwîna wan zarok û kal û jinên ku li Kobanî têne kuştin û penaberiya xelkên me li bajarê Hisiça xwedî derkevin.

zingilê metirsiyê lê da û şer hate ber deriyê me, gelo heye ku hêzên Kurdî destên xwe bidin hev û bi yek gotin û bi yek helwestê di riwê hemû pîlan û kiryarên ku tê ne kirin li ser serê gelê Kurd rawestin û êdî berevaniyê bikin.?

pirseke û divê bê bersiv nemîne çimkî ev derfet a dawî ye, û heger em li hev guhdar nekin û bi rewaneke kurdewarî kêşeyên xwe çareser nekin wê tenê zirar bighê gelê me û pirsgirêka Kurd li Rojavayê kurdistanê.

Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Nivîskar û helbestvan Ezîz Xemcivîn dibêje: Kesên ku evî şêweyê Helbestê dixwazin (Me dijmin talan kir û mala wî xerab kir), nikarim evan kesan razî bikim û ne diramim ku (nehelbestê) binivîsînim”.

- Xwendevanên zimanê Kurdî bi giştî kêm in, lê yê xwendevan be her celebê toreyê dixwîne.
- Nivîskarî mercên wê hene, her yek li ber navê xwe deyne mamoste an nivîskar an helbestvan nayê ewê wateyê ku wêjevan e.
- Helbestvanê rastî û neçêkirî be û ne bi “hin alî an partiyan an bi Televizyonan çê bûbe” tu caran têk naçe.
- Ez xwe Romannivîs nabînim û ne xwe bi çi nivîsandinê paye û qurre dikim.
- Nivîskarê romanê diweste û ne ji bo pesn û salox û şabaşiyan berhem dide..
- Torevan ew kesê ku di gelek beşên toreyê de afrênerî û dahênaniyê bike, ziman bi ruhniyeke din bide.
- Yekem helbesta min jî di kovara (Gelawêj) de sala 1985an hejmara 7/8 hate belavkirin.
- Wêje bi giştî Nasnameya Gelan e, roman beşek ji toreyê ye, lê dimîne li ser ew nivîskarê ku Romanê dinivîsîne çi dikare bide.
- Li nav miletê me nexweşên (kesayetiyê) pir hene, dikarin rojane rêklam û propaganda ji xwe re bikin.
- Yekîtiyên me Kurdan yên (Şev û Rojekê) ne.
- Gerek gava li ser yekîtiyê bête axaftin Kurd serê xwe ranekin. Kurd ne ên Yekîtiyan in.
- Bi giştî dibêjim Yekîtiya Nivîskaran ezmûneyeke baş bû, lê bi saya partiyên dijberî hev û têwirdanê ew yekîtî beravêtî kirin.

Hevpeyvîn:: Ehmed Bavê Alan

Ezîz Xemcivîn di sala 1965an de li bajarê Hesekê, Rojavayê Kurdistanê,(Bakurê Sûriyê) jidayik bûye. Sala 1985an ji Peymengeha Elektrik (kehreba) der çûye.
Sala 1982an dest bi nivîsandina helbestê kiriye, yekem helbesta xwe di kovara Gelawêj hejmara7/8an sala 1985an) belav kiriye.
Di sala 1990î de yekem berhem (A-B eya Kurdî) alfabêya Kurdî çap kiriye.
Bêtirî ji 10 salan ew li Dewleta Imaratê maye, û ji sala 2011 an de berê xwe daye Almaniyayê, û li wir nîştecî bûye.

Di despêka vê hevpeyvînê de em dixwazin hûn bi çend gotinan vê hevpeyvînê vekin..

Di geşbîniya pênûsê de werzê pelgan û bişkuvînê..
çend gotin û şîrava dilê cegerdar li ser basikên çandekê, kultûrekê û evîna nivîskarekî, tevlihev dibin û berhem didin..
Ji ewan berheman navê nivîskar tê, ji çiyayê dilgerm, li kolaneke bajarê Hesekê qêrîna yekem kir û çavgirtina dawî ez nizanim dê li kû be..
êvarên mêşin ku tenê dengê xwe bi ser hêviyê de bilind dikin.
Çavên evînê û pirsên di xweziyê de dîl mane, berê xwe didin pelgên basklerizî û li ser mehfira keserê êdî ber bi asman ve difirin.
Pênûs çavên xwe di himêza keskesorê de vedike, piraniya rengan dişopîne û navê deryaya helbestê ji kilê çavên evînê heta bi keviyên nêrgizîn li ser tayên tentenya dîtinê dinivîsîne..
Silav û spasî bo xwendevanên Rojnameya “Bûyerpress” û destxweşiyê li we berpirsên Rojnameyê dikim.

- Hinekî li ser rewşa çand û nivîsandinê li bajarê Hesekê kevin û nû baxive?

Bajarê Hesekê wek hemû bajarên Kurdistanê, Kurdên rewşnbîr û nivîskar û hem yên guhdanê li çand, ziman û wêjeya Kurdî dikin hene. Bajarê me bingeha Yekîtiya Nivîskarên Kurd lê hate damezirandin, di heman dema ku tu Şax nehatibûn damezirandin û ne dikarîbûn li hev bikin. Lê nivîskarên Hesekê lihev kirin û xebateke bêhempa kirin û neketin bin bandora çi rêkxistinê..
Nuha ez rewşê baş nizanim, lê ev nakokiyên ku çê bûn gerek çê nebûbana. Yekîtiya Nivîskaran Sendîke an Dezgehek e gerek bêalî be û gerek Partî têwirdanê tê de nekin. Lê tiştê bala min kêşand ku hin endamên Yekîtiya Nivîskaran pişta xwe bi partiyên xwe xurt dikin û dixwazin şerê aliyê din yê ne mîna wan diramin bikin. Hin jî hene mîna partiya Bas diramin.
Bi giştî dibêjim Yekîtiya Nivîskaran ezmûneyeke baş bû, lê bi saya partiyên dijberî hev û têwirdanê ew Yekîtî beravêtî kirin..

- We çima berê xwe da riya biyaniyê, û li ser rewşa çûnê û destpêka jiyana li biyaniyê nexasim ku ew kes nivîskar be baxive?

Wek tu dizanî ez ne nuh derketime û berê jî tû rewşa min baş dizanî, ev bû 15 sal ez ne li welat bûm, bêtir ji deh salan li Dubey bûm lê serdan dihatim welat û min piraniya hevalên xwe didîtin û li wana digeriyam û hêj ew hevalên min in.
Derketina min ya berî Sê salan, ji ber hin rewşên min yên taybet bû. lê belê tu caran ji welat derneketime û ne welat ji dilê min derdikeve.

- Kengî Ezîz Xemcivîn dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kir, û çima?

Zimanê Kurdî bi şîrdana dayikên me re û girnijîna dê gava qerfan bi şîrmijê xwe re dike, dikeve hest, wijdan û hevdudaniya mirov, min xwe di himêza dêyeke dilovan û bavekî netewperest de çavên xwe vekir. Bavê min herdem danûstandin li ser mijarên Kurdayetiyê dikir, lê têwirdan di rêkxistin û partiyan nedikir, û nedixwest têkeve biwara nakokî û lihevnekirinê.
Lê rojane li ser Kurd û Kurdistanê ji me re diaxivî û hem li Êzgehên (Yerîvan, Dengê Kurdistana Îraqê, Radyoya Bexdadê) guhdarî dikir.
Di piçûkaniya xwe de min li stranên Kurdî guhdarî dikir û min gelek ji wan dinivîsandin, hezkirina min ji ziman re ji zarotiya min de bû, û di destpêka salên heştêyan de min dest bi nivîsandina helbesta Kurdî kir. Yekem helbesta min jî di kovara (Gelawêj) de sala 1985an hejmara 7/8 hate belav kirin.

- Çi sedem bûn hiştin ku tu berê pênûsa xwe bide romanê?

Min berê pênûsa xwe nedaye romanê (ez evê derbirrîne dirist nabînim) lê dikarim bibêjim pênûsa min di derya wêjeya Kurdî de kel, xemgînî û şahiya xwe dike gemî û avjeniyê dike. Dibe ew gemî bi helbestê, an rexneyê, an bi gotar û romanê xemilandî be.
Destpêka salên Heştêyî min helbesta kurt dinivîsand ew hingê piraniya xelkê ew awa hez nedikir, lê ji destpêka jiyana xwe ve tiştê ez pê bawer bim, ez dikim.

- Roman çi ji tore û wêjeya gelan re pêşkêş dike?

Wêje bi giştî Nasnameya Gelan e, roman beşek ji toreyê ye, lê dimîne li ser ew Nivîskarê ku Romanê dinivîsîne çi dikare bide. Roman berfirehiyeke wêjeyî ye, giring e (Dem û Cih û Kesayetî) tirazûyeke lihevhatî be..
Ez xwe romannivîs nabînim û ne xwe bi çi nivîsandinê paye û qurre dikim.
Li nav miletê me nexweşên (kesayetiyê) pir hene, dikarin rojane rêklam û propaganda ji xwe re bikin. Ev “derdekî bêderman e”, yê bawermend dikare bi çavan jî nimêj bike û bê ku qîr bike û ji xelkê re qurretiyan bike, ku bibêje an diyar bike vaye ez nimêj dikim.
Lê nayê ewê wateyê jî ku nivîskar dûrî civaka xwe be.

- Berûvajî vê jî heye, ku helbestvan çaxa têk diçe romanê dinvîse?

Ez evê gotin dirist nabînim!
Helbestvanê rastî û neçêkirî be û ne bi “hin alî an partiyan an bi televizyonan çê bûbe” tu caran têk naçe û tu partî û desthilatdarî nikarin dengê helbestvan têk bibin..

- Li ser romana xwe ya binavê (Zêro) û naveroka wê ji xwendevanê “Bûyerpress” re hinekî biaxive

“Zêro” di çend hevokan de şirove nabe, lê dikarim bibêjim pêvajoya jiyana Zêro pêvajoya jiyana gelek Kurdan e, eger belengazî, sêwîtî, bêwelatî, derbiderî û penaberî be.. Pênûs ew dikare çipikên derdan bike hêsirên tûpan û li ser pelgên dilan binivîsîne..
“Zêro” bi hejmarine pir hindik hate çapkirin daku bi xwediyê xwe re nemire, dibe Rojekê ji Rojan bi çapeke fermî digel xuşkên xwe yên din ruhniyê bibîne.

- Roman “Diya Wêjeyan e”, nivîsa wê hewcedarî gelek zanist û zaniyariyan di hemû celebên rewşenbîriyê de ye dike, anku şêweyekî taybet ji nivîsandinê ye.. tu bi vê nerînê re yî?

Roman şaxek ji dara Wêjeyê ye, hûnandina wê demê bêtir dixwaze û pêdiviya nivîsandina wê bi bihna fireh û zanînê heye..

- Gelo jiyana Ezîz Xemcivîn a li biyaniyê hişt ku di riya romanê re derdê xwe pêşkêş bike?

Min Romana Zêro li Hesekê nivîsand û di 04.08.2012an de bi dawî kir û 06.08an ji welat derketim.. û bûyerên wê hemû hêsirên welat in û bi xemgîniya welat hatine nivîsandin.
Nuha romaneke din di nav destê min de ye, min bi nîvî kiriye, ez ê di dema pêş de berdewam bikim..
Ev bi navê “Naze Müller”e, ew li vir û Istanbulê min nivîsandiye..

- Wek romannivîsekî Kurd, hûn nabînin ku niha destan û efsane çêdibin, û pêwîst e wek ku rojnamevan tên raporan çêdikin, gereke romannivîs jî werin û wan destanan bikin roman?

Dubare dibêjim, ez xwe romannivîs nabînim, ezmûneya min ya dûr û dirêj bi Helbestê re ye. Lê dixwazim hemû karînên hundirê xwe bi pênûsa xwe derînim..
Heta ji min bê ez dê rajeya milet û ziman û çanda Kurdî bikim.

- We karê ragihandin û çapkirinê jî kiriye, li ser wê qonaxê jî hinekî biaxive?

Belê keko min her dem ji bo ziman û Çanda Kurdî xizmet kiriye û ez dê her bikim..

- Dibêjin ku Ezîz Xemcivîn helbestê ne ji hemû kesan re dinvîse?

Ev mijareke berfireh e, gelek fêrî helbesta nehelbest bûye. Helbesta bê hest ya ku tu ewê û gotina kolanê ji hev cuda nake, (Kurdo rabe, me dijmin talan kir û mala wî xerab kir), nikarim evan kesan razî bikim û ne diramim ku (nehelbestê) binivîsînim..

- Di nerîna te de, xwendevanê romanê bi zimanê Kurdî hene?

Xwendevanên Zimanê Kurdî bi giştî kêm in, lê yê xwendevan be her celebê Toreyê dixwîne.

- Taybet bi Kurdî nivîsên Kîjan nivîskarê romana Kurdî bala Ezîz Xemcivîn kişandiye?

Gelek hene û pir jî xweş dinivîsînin, bi hêvî me ku hêj nivîskarên romanê di nav me de pir bibin.
Padîşahî ji kesekî re nîn e, û (Tu kes nabêje dewê min tirş e).
Nivîskarê romanê diweste û ne ji bo pesn û salox û şabaşiyan berhem dide..

- Gelo ewqas nivîskarên navdar ku hatin naskirin wek romannivîs di duniyayê de, çi şêwe û razên wan hebûn heta ewqasî bala xwendevanan kişandin.?

Gava roman bi zimanên zindî yên Cîhanî tê nivîsandin bêguman xwedevanên Zimanê Ingilîzî, Elmanî û Firensî û Rûsî û Erebî .. h.d pir in, lê zimanê Kurdî wek miletê Kurd e heman derdan dikêşe û gelek Kurd hene bi taybetî bakurê Kurdistanê şerm dikin bi Kurdî biaxivin û zimanê Tirkî ji wan re giringtir e, hin bi hin ziman li bakur têk diçe û eger wisa berdewam bike dê di paşerojê de ziman li wir ewê binax bibe..

- Ji romannivîsên navdar bandor û akama kê li Ezîz Xemcivîn bûye?

Berî ku ez nivîskar bim ez xwendevanekî baş im, hêj ez xwendevan im û ji gelekan re dixwînim.
Wek ku di Helbestê de awayê min taybetî min e û stîla min ya min e û bê bandora tu kesan e, di romanê de jî wisa bi şêweyê xwe dinivîsînim..

- Gelo çêdibe Toreya Civakî “ Facebook” nivîskaran çêdike?

Tu caran yê ne nivîskar be, bi belavbûnên Facebookê nabe nivîskar.
Nivîskarî mercên wê hene, her yek li ber navê xwe deyne mamoste an nivîskar an helbestvan nayê ewê wateyê ku wêjevan e.
Carekê xoretekî nuhatî nuh dest bi nivîsandina helbestê kiribû, xwest nerîna min bistîne, pir hez dikim ku nivîskarê rastîn li nav me Kurdan pir bibin û yên çêkirî dest ji xwe berdin. Min got keku ez kêfxweş dibim ku tu bi kurdî dinivîsînî, lê dixwazim tu berî her tiştî gotina (Helbestvan) ji ber navê xwe rake. Bila pênûsa te te bide nasîn.. nav nivîskar çê nake, lê nivîskar nav çê dike.

- We bi zimanê erebî jî nivîsandin kiriye, çi cudahiya nivîsandinê di navbera herdû zimanan de heye?

Zimanê Kurdî zimanê dê ye, afrênerî li bal min bi Kurdî xweştir e. Hin nivîskarên me bi zimanê Erebî ji nivîskarên ereban bêhêztir nivîsandine.. Lê mijara cudahiyê gelek e, Zimanê Erebî gelek kar jê re bûye, di dibistanan û zankoyan de hatuye dan, pêşve çûye û hejmara kesên ku pê dinivîsînin bêtir ji 300 milyon kesan e.

- Em çi navî li nivîskarê romanê bikin, gelo dibe ku navê wî bibe “torevan”?

Torevan ew kesê ku di gelek beşên toreyê de afrênerî û dahênaniyê bike, ziman bi ruhniyeke din bide. Romannivîs, an helbestvan, an rexeka, Çîroknivîs ya giring bikaribe ziman û ciyokên zimên vepexirîne..

- Di qada nivîsandinê de we çi xelat hetanî niha wergirtina?

Xelatên ku min wergerin yek ji mehrecanê rewşenbîrî li Duhokê û yek ji Hevdîtina Kurdî Erebî li bajarê Şariqa ya Dezgeha Semakurd li Dubey û yek ji bo rajeya zimanê Kurdî ew jî ji dezgeha Semakurd.

- Li gor ku hûn jî dişopînin, gelek yekîtî, komel, û hevbend ji bo nivîskaran çêbûne, lê hîn jî di nav nakokiyan de dijîn, sedem çi ne ku nivîskarên Rojavayê Kurdistanê di bin sêwanekê de nacivin?

Yekîtiyên me Kurdan yên (Şev û Rojekê) ne.
Gerek gava li ser yekîtiyê bête axaftin Kurd serê xwe ranekin. Kurd ne ên Yekîtiyan in.
Piraniya miletê Kurd ên şabaşê ne û ji bil şabaşiyê (Siwarê Hespê Xelkê ne) di kîjan kêlîkê de berjewendiya dijmin pêk ve nema pehîna xwe li paşiya Kurdo dixîne..
Xwezî Yekîtiya Nivîskaran destê partiyan û peyayên serokan neketibayê ewê hingê bêguman Dezgeheke serkeftî bihata der û nûnerîtiya Nivîskaran bikira..

- Berhemên Ezîz Xemcivîn ên be herdû zimanan hatine çapkirin çend in û çi ne?

Keko berhemên min tenê bi Zimanê Kurdî ne, û yên çapkirî jî ev in:

1. Zindana Piçûk (Duhok 2005)
2. Pejal, (Dubey 2006)
3. Alfabeya kurdî (Şam 1990)
4. Jiyana Mele Ehmedê Palo, wergerandin ji zimanê erebî (Weşanxaneya Hîro)
5. Gotinên Pêşiyan (Silêmaniyê 2011)
6. Romana Zêro

Berhemên neçapkirî (Destnivîs):
1-Evînî û Bîrhatinên Çivîkan (Bîranîn û serpêhatî)
2-Stranên Jînê (Dîwaneke Stranan, Helbestên kilasîk)
3-Pêlên Ahîna Matmayî (Helbest)
4-Çend Bihnok Li Pêxîla Keserê (Helbest)
5-Henaseyên Rêwîng. (Helbest)
6-Delîveya Rexneyê (Rexne).
7-Şîrava Elindê (Helbest)
8-Nixîsk (Helbest)
9-Zimanê Evînê (Helbest)
10-Nazê Mûler(Roman)
11-Kewara Girî (Delîveya Rexneyê beşê 2) Taybet li ser Jinê

- Gelo berhemên we, hatine wergerandin, û bi çi zimanan hatine wergerandin?

Berhemên min tenê hejmarek ji helbestên min hatine wergerandin bo zimanê Erebî û hin ji bo zimanê Elmanî. nuha jî romana Zêro tête wergerandin bo zimanê Erebî.
Li vir vexwendineke fermî ji min re ji (Kreis Schleswig) par hat, min bi cilûbergên Kurdî li Navenda (Kreis)ê min helbestên xwe xwendin û jineke Elmanî (Keşe) werdigerand zimanê Elmanî..

- Gelo romannivîsê Kurd dikare li pey nivîsandina romanê, nanê zarokên xwe qezenc bike?

Roman bi Kurdî kêm tê xwendin, firotin, û kêm tê çapkirin..
Lê hene bi zimanê Erebî an Tirkî dinivîsînin pereyan qezenc dikin.

- Gelo romannivîs ne di nav rewş û bûyrên romana xwe de be dikare wê romanê bi awayekî serkeftî binivîse?

Çi berhema wêjeyî be ji jiyana nivîskar cuda nabe. Gava nivîskar rişma helbestê an romanê an çîrokê ji dest xwe bernede ewê bikaribe berhemeke serkeftî binivîsîne, lê gava ku serê xwe jê re deyne ewê hingê dê hevsar ji dest derkeve û karê wî dê têk biçe.

- Gelo Ezîz Xemcivîn dixwest ku bibe nivîskar?

Jiyana nivîskariyê tiştekî din e, jiyaneke xweser e, pir berpirsiyarî ye, taybet e.. pir xweş e.. û pir ne xweş e.. Nivîskar bi piranî (eger ne peyayê Partiyekê an serokekî be) ji derveyî ragihandinê dimîne. Piraniya ragihandina kurdî bi siyasetê ve girêdayî ye, bi rêkxistinan ve girêdayî ye..
Gava nuh hatim Elmanya hin ciwanmêran aşkere ji min re gotin eger tu bibî hevalê me em dikarin te rojane bidin pêş(mebest di ragihandinê) de .. min got ez rojekê ji rojan nebûme peyayê çi partiyê, bila ez di ragihandinê de dernekevim û bila ew şabaşçî ji min hez nekin.

Gotina dawî ...

Destê we xweş be, lê pirsên we pir bûn û bihna min çikandin..
Silav bo we û hemû xwendevanên Rojnameya “Bûyerpress”, bi hêvî me hûn herdem serkeftî bin.
Zor spas..

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Ey Serokê Mey Birêz

Xalid Umer

Ji Himêza PDKê
Ta himêza PKKê
Em nivîskarên Welat
Kî dixwazî şevekê
Wêjeya Kurdî guneh
Wêjevanêj` kapekê
Her bi ser pîka diçe
Vedigerînin pêçekê
Ey serokê mey birêz
Ka berê tel` kûdekê
Megrefonên partiyan
Ne belaş in hey kekê
Milletê min dê bibûr
Dem dema vê fîşekê
Em ne wijdanê we ne
Digerin li gepekê

Qewîtiya Evîndarekî

Çelebî Bêmirad

Heger rojekê tu
Li evîndarekî rast hatî
Delala min
Û te di bêdengiya wî de
qîrîn bihîstin
Û di lêdana dil de
êş û azar pelandin
tu yê
Di kavilên çavên wî de
bibînî beyarên bendewariyê
# # # #
Heger rojekê tu
li evîndarekî rêwiyê rêya
bêveger rast hat
Û te di buxçika dilê wî de
evîneke piştxûz dît
bzanibe
gotinek layiqî eşqa xwe
nedît û di dilê xwe de
ew pîr kir
bi destarê qederê hêrand
û bi bayê felekê re didêrîne
# # # #
Heger rojekê tu
li ser rêyeke payîzî
û di bin darek hinarê de
di ber gorek bê nîşan buhirî
delala min
hema biqasî çend kêliyan
raweste
û bi nazî bi serê tiliyên xwe
li ser dirêjahiya gorê
binivîs
Mem
Ferhad
Siyamend
û Derwêş
bi xwedêkî tu yê ji bîr mekî
li ser kêla ber ser wî deynî
BÊMIRAD

Dayê..

Miş`el Osman

Diyarî bo : Mamoste Mehmûd Sebrî
Gava rondik
di çavên mêrxasan de
diçrisin
tu tê bîra min
-dayê-
kelogirî dibim.
Ava hêlê
tê bîra min
piştiyên pûş
nanê tenûrê
kilora pevçûnê.
Bo desmalê
çendî caran
agirê tifikê gûr dibû
çi bêjim
- dayê-
çi nebêjim
li ser wî qelaçî
kereng û pîvong
berdana bustana
terhikên
di bin kulînê de.
Jiyana
di nêv ebriwên bavê min de
windayî
bi hezaran pirs û raz
bi hezaran çîrok nayên xwendin
wê çaxê
Rojhilat
Destpê dikir
Û li ser erzêlê
dihate raxistin.
Dengê birûsk û tavan
sawa Gurê Manco
çendî caran
maldarên gund
keroşkên me di serdaban de
vedişartin
çendî caran
ji dara tuwê
çivîk dixistin
hemû tişt tanîn xwar
dîwar,beşt,
çira û
pelpelûkên bin erdê.
Dara tuwê
kirin êzing
û di goristanek bê gor de
bavê min winda kirin
Pirsên giran
sar û germ
di bêdengiyê de
li hev pêçan.

Bêje dilo

Luqman Ebdurehman Diyarî : bo nivîskar Miş'el ê Osman

Çûn
Cî lale
Dengê min bê ave
Çav ji hêsira lalin
Bêje dilo bêje
Wê kî xweşke sibehê min
Dagre bi fîxana demê min
Bêje min bêrya we kirye
Cî teng e
Tenê gotinê xwe bihêlin
Bela kevokê sipî bifirin
Bajar û gund …
Ta nalîna xewnên min
Mîna berfê bin
Cî teng e
Toz e
Zuhaye
û dem sar e
Kanî ewrên ezman
Ta bişkîne tîna axa can
Bela canê min mizgefta min be
Bajarê min be
Bîr anîn ji kaniyê dertên
Xwê dikin birînên min
Aaa … x gelo
Xerîbim di cî de
Di demê de
Xerîbim ez xerîbim
Bêje dilo bêje
Welat bê we pûçe

Riya Dil Tim Şaş e

Şivan Mehmûd

Bi gotinên giran dil şikand
Li nîvê gond derdêm gerand
Dil nazik im nizane
Dîl im ew zane
Lê xwenêm rêzan e
Tu bi xwedê ke ..delala min
pêlên derya çavê te
Derd in ji qeyikên dilê min re
Tu bi xwedê ke ..dizeka min
Qîrînên gaznê min gihiştin xwedê
Canê min li min vegerîne
Tu bi xwedê ke..kezeba min
şevêm har in sar in
girnijînên min bê sitar in
Tu bi xwedê ke ..Qurbanê
çawa tiliyên te bê av mane
xwedê kaniyên min ziwa bike
Hêviyêm navêje newalê
Di çav de xuyaye evîndariya te
Raman wekî teşî
Tu lê ba dide derdan
Dilêm wekî meşkê
Dilanê tu lê xweş dike
Hêdî hestî neşkê
Zanim rê xwar e û kaş e
Riya dil tim şaş e
Were kerwanên kenên xwe bibe
Dizekên şevê min şîretke

Ji Hewla Gihişta Newa Dengê Te

Kawa Îsa

Guh rêwîbû ji laş
Çi sist û ker ma
Ez çi karim bikim
Heger ji serma
Ew pel
Di himêza darê de zer ma
Bûne kavil û beyaban mêrgên te
û dilê lawîn
Çi pîr û koçer ma
Piştî can bargehê hemî çarabû
Di tariya tenahiyê de
Penaber ma
Dîsa jî qayil im bi penda Yezdan
Ger hêvî min bixapînin
Qeder ma

Biçûka Min Mezin Bûye

Hekîm Ehmed

Vê cejnê,
kê şekirokên te dizîn?
Kezeba axê!
Soz..
Ez ê bi te re bigrîm,
bêjim: Na..
Vane heskiriyên te,
kesk û sor û zeran diçînin.
* * *
Vaye Arînê,
destê xwe,
di ser axa te re tîne:
(Na, na, na..
Delala rojê!
Ez ê guhê şevan badim,
pozê cengê jêkim).
* * *
Wa ye Mihemedê te dikene:
(Derbas nabin,
hov derbasî buhiştan nabin).
* * *
Tiştê min matmayî dihêle:
Ewqas mij û toz,
birîn li ser birînê bar dibe,
mêjî û dil li hev digelicin,
lê bi her banga limêjekê re,
xwîn pak e,
hêsir zelal e.
* * *
Vane hecxwazên te jî,
stiriyên sînoran,
ji piyê xewna te derdixin,
dipirsin:
(Kê bazara xwînê,
di hembêza te de veda?
Em ê şekirokan,
nok û mewîjan jî,
ji sibehên teyî kenok re,
vegerînin).
* * *
Penaberek diqîre:
(Ez arziyên xwe,
nadim,
ez ê ji hemû kabûsan vegerim,
te haş bikim,
birîn bi birîn,
li pêxemberên te bigerim).
* * *
Navên qelb,
li ser paçên reş,
li Mişteriyê nayên..
û mûşekên li asîmanê te..
li kîjan dera dilê min bikevin,
min dêşînin.
* * *
Heriya te,
nivişta me ye.
Zimanê min,
nema di çavê bira de dîlan dike.
Nerîna wî,
Stirana ber dergûşa min e.
Hemî qaqilên namûs,
mêranî û kurdewariyê,
di lavija zarokekî de dihelin.
Heriya te nivişta me ye.

Ciwanino bi goka xerîba melîzin....

Beşîrê Mele

Ez gundekî bê bender im
Sê keleşan ez tezî kirime xelkîno…
Kes min nas nake
Zimanê min ferimitiye û hinekî jî min…!
Ez bi nîşandekan dipeyivim
Lal im, lalo yê dîn im
Kevirekî gindirî me ji Besta Darê
Bertewîl im lêmistan li bejna min girtiye
Ez Heydero me, Simaîl û Newafê dîn im
Ez gundekî ji çar gundan bûm
Çemekî ziwa bedena min qusandiye
Bi tereşê serhildanê berê pêçayî me
Ez zarokeke heftê salî me
Bi werîsên kevnar di keşitiya Haniştayin de
Bestî me xelkîno…
Ez tenûra nanê xelkê me
Qalûna kê û kê me
Li ser bedena minî pemboyî
Agirê reş tê dadan
Sîneme di cerga min de dişewitin
Dibe agir bi agir dikeve?
Ji kengî ve cencera kovanan di bêndera
Dilê min de vê qehrê gêre dike?
Çendî genim di sînga min de diseridin
Zîwan û sitryê deva jî li hev digerin
Du bayê fireh hatin û min şebeş nedêran
Qayişek reş min kal kir û ez nezam
Germa Tebaxê li pişta min da şîn nebû
Bêhnek ji Buharê tête
Bi guhekî çeng bûm
Dengê Daholê tê û zirne pêva
Ji çi direvim ber bi sînoran
Min xwe li ku xest û nexest
Min têr baz neda
Ne tenê dîn im…
Lal im…
Sewalek kerr im
Kê min bi çolan xistiye gundîno?
Qena bêjin çim tu revya?
Vedigerim….
Ser çavkan li ku bibînim ez ê biqetînim
Reş guzlikan li ber çavê kê bibînim
Ez ê bişkînim ….
Kî çi dibêje bila bêjin Ez dîn im…
dîn
Li min megrin xelkîno
Dilê min di êşê de ye
Roj bi halê min digrîn
Sitêr tilyên xwe diqrçînin û dirijin
Dibên: ji zarokên xwe re bêjin
Bila keviran bavêjin Gurê tavê
Bila ji ronaya roj û heyvan hez bikin
Bila ji maran aqiltirbin û bibin
Evindarê Axê
Ez şîno me şînê dîn im
Şanogerekî vê serdemê me
Serê xwe û dilê xwe
Ji xwe dikim davêjim nav we
Da bi goka xerîba melîzin ..
melîzin
Dibin lîstekvanê gundê xwe
Wê bender jî li gundî vegerin….

Tirs

Aştî Hesen Lal

Min ji tirsa xewnên xwe li cîkî nediyar vedişarin
Û ez hew bi ser vedibûm
Dibûm lêgerokek li pey wan xewnên xwe
Û ez dilerizîm
Min navê xwe jibîr dikir
Û gelek rê dihatin pêşiya min
Lê min rêya malê wenda dikir
Dînekî beradayî li kolanan dibû hevalê min
Min wêneyên tirsê di çavên wî de didîtin
Û min ji wan saw digirt
Û dîno bi min re dibû hevalê tirsê
****
Lewra tirsa min bêtir bû
Û em ji sîberên xwe direviyan
Li cîkî tarî em radiwestiyan
Ta sîberên me ji dû me vedigeriyan
Û em û tenahiya xwe diman
Me pesnê hev bi mêranî dida
Lê mixabin tirsê zora mêraniyê dibir
Û me tu çare ji tirsê re nedidît
Tevzînoka em digirtin
Û xwêdan ji eniyên me dadiwerivî
Û em ji herdû jî ditirsiyan
Ji sawa tirsê
Hevalê min ji min vediqetiya
Û me bi fermiskên çavan bîranînên xwe dişuştin
****
Û em jî di wan bîranîna de
Ji paşila dayika xwe dihatin girtin
Çiko sînor ji min re hatibûn danîn
Min ji tirsa sînor derbas nedikirin
Tirsa min ne ji sînora bû
Lê belê tirsa min ji mirina dûrî welat bû

Ez û Tu....û Welat

Ez û tu …welat
çîrokek windayî
di nav pirtûkên xweziya de
Efsaneya eşqeke
Bidawî hatî
di çavên Xweda de
Ez û tu.. û welat
Îro bi kefenê biratiyê
hatine pêçandin…..
di goristana gunehan de
binax bûne
Li ber bayê buharek pûç em
omîd û xweziyên xwe didêrin
Ez û tu …. û welat
Tîp di hindirê nameya me de
Ji hev cihêbûne
Li qiraxa sînorê mirinê
li hev kom dibin
Binav bûne hêviyên me
di gemiyên bazirganên mirovatiyê de.
Ez û tu …. û welat
Kê em şiyar kirin ji wê xewnê,
Ji wê paşeroja şêrîn?
Kê gul ji nav baxan çinîn,
Bumbe û mayîn li dewsê danîn?
Ji dil guhestin kêf û şahî
Li me dojeh vekirin bi sed derî .!
Ez û tu … û welat
Bi tenê dikarin li dêman vegerînin xwîn
ji ewrê hêviya baranê bibarînin
Ez û tu ….û welat
Bi tenê dikarin.....

Weşanên Nû

Şewq û Fener"a Salihê Heydo Derket

Di 12ê meha cehzeranê, 2015an de, Diwana (4) ya
Helbestvan, Nivîskar û Folklornas Salihê Heydo hate çapkirin. hêjayî gotinê ye ku ev Dîwan dibe pirtûka 16an ji rêza pirtûkên Salihê Heydo yên çapkirî, dîwan bi navê
"Şewq û Fener" hatiye weşanê û sê beşan bi xwe ve digire .
Beşê Evîndarî, Beşê Welatparêzî û Cîvakî, û Beşê Sêyem Helbestên Zarokane , Ev dîwan ji 150 rûpelên navincî pêkhatî ye û 47 helbestan bi xwe ve digire, çawa tê zanînê çapkirina" Şewq û Fener " li ser Erk û diravdayîna partiya (P.D.P.K.S) ye. Em jî weke rojnameya Bûyerpress vê Dîwanê li pirtûkxaneya kurdî û xwendevanên zimanê kurdî pîroz dikin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Hip Hopa Kurdî

Bi guhertina asta jiyanê gelek rengê muzîkê hatin guhertin, û gelek ritim ketin muzîkê mîna Rap , Pop, û Hiphop.

Gelo Hiphop çi ye û cihê wê di muzîka kurdî de li ku ye?

Gave em navê Hiphop dibêjin navê hunermendê Kurd Şerîfê Omerî (layê Qamişlo) tê bîra me, û wek em zanin Şerîf Omerî gelek sitran li ser civakê mîna: Evîn, Kocberî Şoreş û Azadî, bi awayê Hiphopê çêkirine.

damezirandina Hiphop rengek muzîkê li Afrîqiya di sala 1931ê de hat damezrandin, di dema mijara azadiya xwe wek miletek reş di nav diktatoriya miletê sipî dixwest bi gotin û ritm şîrov dikirin, ew muzîk li gel wan mîna helbesta şoreşê bû ,û li ber wan sitranan hest û germbûna netewî dihat sazkirin. û bû mîna sirûdek netewî û ev reng belav bû ta geihişt ku serkêşê diktator vî rengê muzîkê qedexe bikin, loma miletê Afrîqî xwe li wî Hiphop girt û kir mîna nasnameya xwe di nav miletê cîhanê ta gihişt azadiya xwe.

Gelek mînak hene li ser rexnê Hiphop di nav miletê reş wek çawa serok Mandêla dîlan li ber Hiphop kir di dema bû serok de hene.

Hiphop li muzîka Kurdî bû mêvan, û ew mêvan bû xwediyê malê ....!!

Gelo ev mêvan ji ber şêrîn bû, loma bû xwediyê malê?

Yan Hiphop bû wek bivik li ser çand û hunera Kurdî?

Ev kesê ku li Hiphop bûn xwedî, çawa di civaka me de tên naskirin?

Bersiv, bi gelek xala tê gotin, û bi piranî di nav nifşê nû de tê erênî, û mîna formek nû ji muzîka kurdî dîtin, lê gelek ji hunermendan dîtin ev Hiphop gelek êş li çand û hûnera me kir, ji ber ne awaz û ne gotin tê de hene! û ev Hiphop çanda xelkin dîn e û bandora wê li ser nifşê nû mîna xerabkirina hişê mirov e. ev nerîn ji hev cuda bûn, û rêz ji herdû nerînan re heye.

Ev dide diyarkirin ku Hiphop mîna gelek rengê jiyanê bi hest û ramana hatiya girêdan, gelek riyê wê hene û çanda Kurdî bûye mîna gulîstan gelek rengê gula hene û her gulek bi bihneke taybet, lê tev de wêneya jiyanê dixemlînin.

Penaber û Penabertî li Ewrupa

“ Bi taybet li Hungaryayê û bi peyvne pirr zelal gotin: Em nema dikarin pêşewaziya penaberan bikin û yên ku tiliyên wan jî berê li cem me hene dîsa jî çênabe li me vegerin û hevpeymana Dublin ji xwe me nema divê”

“ Yê Ewrupa bêsînor bixwaze divê xwe li hevpeymanên wê jî bigre an Ewrupa û hevpeymanên wilo ji me re nabin”.

Alan Pîr Mem

Ji xwe vê dawiyê deng gelekî bilind bûn û tirs jî her wiha xurttir û dijwartir bû ji gelek aliyên Ewrupî ve ku rojane bi hezara penaber ji hemû deverên cîhanê ber bi welatên wan ve tên her bîst û heşt welatên Ewrupî yên ku sînor di navbera wan de tunene li gorî hevpeymana Şengin ya ku di salên destpêka heştê de hatibû danîn. û ji xwe tirs ji vir ve destpê kir .

Di kongireya wanî vê dawiyê de li paytexta Belgien li Brüssel li hev rûniştin û li tenişt kirîza Yonanê û deynên wê û serêşiyên ku ji Elmanan re çêkirine doz û doseya penaberên ku ber bi Ewrupa ve bi rojane tên bi firehî hate vekirin û tê de wekû biryarekê hate sitandin ku her welatekî di yekîtiyê de di EU-Europa de divê êdî xwe li hevpeymana Dublin bigre ji ber ku çênabe penaber bi tenê li çar an pênc welatan belav bibin û mafê penabertiyê li wir li wan welatan werbigrin, lê divê welatên din jî her wiha vê berpirsiyariyê rahêjênê çawa ku dengê Angela Merkel ji Berlinê ve bilind bû û ev got . ji aliyê din ve û Bi taybet li Hungaryayê û bi peyvne pirr zelal gotin: Em nema dikarin pêşewaziya penaberan bikin û yên ku tiliyên wan jî berê li cem me hene dîsa jî çênabe li me vegerin û hevpeymana Dublin ji xwe me nema divê, lê ka me ev wilo bi hêsanî jî derbas nebû, li Austriayayê wezîra navxweyî û bi dengekî bilind di riwê cîranê xwe de di riwê hikûmeta Hungaryayê de rabû û got: Yê Ewrupa bêsînor bixwaze divê xwe li hevpeymanên wê jî bigre an Ewrupa û hevpeymanên wilo ji me re nabin, û ji xwe ji cara yekemîn re ye ku Ewrupî wilo gurr bûne û ji hijmarên mezinî mezin ji penaberan tirsyane, yên ku ji welatên şer û xizanî û pirsgirêkên ol, ayinî rêçewazî û siyasî û aborî direvin û li jiyaneke xweş û pêşerojeke xweştir digerin. Û ji xwe Italyayê jî dengê wê ne nizimtir û lawaztir bû , wan jî nema penaber divên û ji berê ve ji xwe ew rebena ne li kulanan radizên û pars û pîstî û diziyê dikin ji ber ku hikûmet mafê ne kar, ne rûniştin, û ne xwendinê li Italyayê dide wan lê ya baş ewe çawa ku penaberan digot: Ku hema rê ji me re vedikin em ber bi welatên din ve herin wekû Elmaniya û Siwêd û Norgway û Dênîmarkê .

Lê ka û pirsa mezin ev e , wê sibe piştî deh salên din çi bibe ku wilqende penaber û biyan û koçer û revyayî û mişext li Ewrupa îro ro dijîn, ji kêmê wan re kar û xwendin û mafê wergirtina kaxezên fermî ji aliyê hikumetê ve derdikeve, wê ber bi ku ve de êdî rewş here û wê li kîjan asteyê raweste? Ev e ya ku êdî dîrok û mêjûyê xwe bi xwe vedigerîne û radixe li ber çavan ku wê Ewrupî êdî ji niv re li welatên tirs û şer û perîşanî û nexweşiyên gemar û bê sînor, welatên nakokiyên siyasî û ol û ayinî û mirina aboriya bi rast bibin koledar lê di cilê xwe yê nû de, cilê ku îro ro ev penaberên reben li wan dikin

Gulle Ji Çeperên Şer Ta Bi Şahiyên Di Bajaran De

“ Gellek rengê şahiyan hene ji bilî teqandina gulleyan, û helbet dema ku serkeftinek bêhempa hebe, em dê karibin hestên xwe derînin û bi gellek regin din”.

Ebas Mûsa

Di zaroktiya me de, di salên notî de, me tenê dengê gulleyan di şahiyan de dibhîst, hertim kesek hebû derdiket nava govendê, û çend gulle diavêtin ber bi asîman de, û her wiha di şahiyin bi vî rengî de, bûyerin ku çêdibûn tim girêdayî gulleyên çewt bû, yên ku şahî dikirin şînî. Ji çar salan û vir de gulle bûn tiştekî normal di jiyana me ya rojane de, nifşek ji zarokan vaye li ber dengê gulle û bumbeyan mezin dibin.

Ji destpêka 2012an ve û ta aniha şer li Rojava nerawestiya ye, jixwe li Sûriyayê tevayî jî, hertim çeperên şer germ in û li seranserî vê demê serkeftin û şkastin hebûn. Di serkeftinan de gellek xelk derdiketin û gulle ber bi asîmanan de berdidan, ev rengê han ji şahiyê bû diyardeyek, û beşek mezin ji xelkê tê de beşdar dibûn.

Berdana gulleyan bi rengekî pirr, -wekî yê ku di kolanan de dibe-, encamin neyênî dide, û heger em vê diyardê binirxînin emê nêzîkî sedemên wê bibin. Helbet dema ku serkeftinek leşkerî hebe, û ji bo vê serkeftinê gellek gulle bêtin berdan, wê moralê xelkê bilind bibin, lê berûvajî hestê serkeftinê, encamin xerab jî derdikevin, a herî xerab jê ew e bi dehê çîrokan hene ku gulle li kesnan ketine, hin ji wan gihane ber mirinê.

Ji bilî vê yekê jî dengê gulleyan bandoreke pirr mezin li derûniya zarokan dike, û tirsê dike hinavên wan de, û ji ber rewşa awarte, nema kes dizane gelo gulle bo şahiyê ne, yan jî tiştek qewimî ye.??!

Li hember diyardeyeke bi vî rengî ji Asayîşa Giştî tê xwestin ku bikaribe wê bidawî bîne, tevî ku Asayîşa Giştî daxuyaniyek derxist piştî ku gellek kesan ev diyarde rexne kirin, lê ti encam neanîn, ji ber ku ta bi endamên Asayîşê jî li gellek deveran gulle bi geşbûn berdidan.

Şaştiyek heye di rengê şahiyan de, ji aliyê civakê ve, û helbet sûcê rêveberiyê tê de gellek e, li hemberî diyardeyeke wisa rêxistinên civaka sivîl jî ti proje lidar nexistin, an jî ti çalakî û bi çi rengî nekirin, ji ber yek ji karên rêxistinên civaka sivîl ên sereke ew e ku çavan li neyêniyên diyardeyên wisa veke, û zextê bike da ku aliyên xwedî biryar ne tenê daxuyaniyan derxin lê li ser erdê pêk bînin.

Ji ber ku ji bilî van neyîniyê vê diyardeyê gellek pere tên rijandin, ligel rewşa abûrî ya awarte ku Rojava tê re derbas dibe.

Tenê em nas bikin bê ji boyî lîstka gokê û serkeftina tîmekî, gulle tên berdan, em dê wê çaxê nas bikin bê çi qasî dest hatiye berdan bo teqandina gulleyan. Peydabûna çekan bi gellekbûn di nav destên xelkê de, yek ji wan sedeman e ku berdana gulleyan jî pirr be.

Diyardeyeke mîna berdana gulleyan ber bi asîmanan de, nabe ku bi çavekî biçûk were dîtin, û ji bo ku ev diyarde raweste yan jî kêm bibe, diviya ku aliyên xwedî biryar bi xurtbûn li hemberî wê yasayan pêk bînin, her wiha gerek rêxistinin civaka sivîl di barê vê diyardeyê û çi diyardeyên bi vî rengî bi rola xwe rabin.

Gellek rengê şahiyan hene ji bilî teqandina gulleyan, û helbet dema ku serkeftinek bêhempa hebe, em dê karibin hestên xwe derînin û bi gellek regin din.

Ji Serpêhatiyên Reşîdê Dalînî

Çawa çêlek berxikê şîr dide Gelek ji jiyana xwe di şivantî û gavantiyê de bihûrand, û gelek tişt bi serê wî hatibûn, û pir tişt dîtibûn, hemû jê re bûbûne zanebûn, û wek bizîşkekî ajalan bûbû, û gelek nimûneyê vê yekê hene. Dema ku çêlekek yan pezek lingê wê şikestibaya, wî devera şikestî rast dikir, û çar tepik didan dorê,û qenc girê dida, û wisa sax dibû.

Çaxa çêlekek zaba û golikê wê miribaya, wê xwediyê wê biçûbaya golikek yan berxikek anîbane, Reşîdo wê bihişta ku ev çêlek û golik yan berxik li hev bûbana,

Ew dixistin hundirekî, û ka çawa dikir û çi ji wan re digot?! û paş re lihev dikirin, û ew çêlek dibû dê ji wê golikê yan ji berxikê re.

Dema ku berxikbaya, ew berxik dibezî diçû nav garanê ber diya xwe şîr divexwar, û çêlekê ew wekî golika xwe didît, lê ka Reşîdo çi ji wê çêlekê re digot: Ev jî ji me ve ne diyar e, û ev jî ji taybetiyên Reşîdê Dalînî ye.

Reşîdê Dalînî û Sedamê Diktator

Di sala 1988an de Sedam kîmawî avête Kurdan û bi taybet bajarê Helebça û gundê derdora wê, ev karê nemrovahî, bûyerek bêhempa bû, hişt ku di civaka Kurdî de bibe mijara herî dilêş, û li ser were axftin di civatan de, û li ber dîawran:

Dibêjin, Reşîdê Dalînî ji civatekê dihate malê, û derbasî hundir bû, û piştî pêlava xwe ji nigê xwe kir, û li tilfiziyonê temaşe kir, di wê kêlîkê de, dektatorê Îraqî Sedam derdikeve, û hîn Reşîdo, di bin bandora kelekela civatê de ye, Reşîdo di wê kêlîkê de, û bêyî ku dûdilî be, dirahêje pêlava xwe û davêje ekrana tilviziyona ku wêneya Sedam li ser derdikeve, ekranê hûrhûrî dike.

Li dû bûyerê Reşîdo bihna wî ferh bû, û ewî ticarî poşmaniya xwe derbarî şikestina ekrana telviziyonê nedigot, ew mirovekî wisa bû, kurdperweriya wî di dilê wî de bû , li ser zimanê wî bû, û nikarî bû ji bo wî hestê xwe derberîn neke.

Zindana Qamişlo, Reşîdo û Şeroyê Teşqelçî

Reşîdê Dalînî li ber dewarê xwe bû, û hevalê wî Hesenê Hemo li ber sewalê xwe bû, û ji ber ku ketibûn ber têla sînorê Tirkan de, polîsê Sûriyê ku li rastî wan hat, ew mûxalefet kirin, û ew xwestin dadgehê piştî çend rojan, di encamê de, ew çend rojan ketin zindana Qamişlo de.

Li wir dîtin ku her car xwarin ji yekî girtî re tê, yek dirabe diçe pariyekî ji wê xwarinê dixwe, ku xwerin xweş didît, wê bixwe, û yê mayî dida xwedî.

Reşîdo dibêje ji Hesenê Hemo re: Bi sûnd ez ê ji vî zilamî re nehêlim eger ku rojekê destê xwe bavêje xwarina min.

Çend roj derbas bûn, xwarina Reşîdo jê re hat bi hinek hevalên wî re.

Ew ê girtiyê dest dirêj, dîsa çû ku destê xwe bavêje wê xwarinê, Reşîdo nemerdî nekir, lê wî tiştek nedît ji bilî şimika xwe, rahiştiyê û bi derbekê re li tepê sînga wî da û ew avête erdê.



Wisa herdûyan xwe davêjin hev, lê girtiyên hevalê wan, nahêlin ku hevdû zeft bikin.

Yê destdirêj diçe û tê û zirtê xwe dike, û her û her guhikê çakêtê xwe gez dike ji kelekela hinavê xwe; û dibêje: em ê niha derkevin hewşê.

Demek nedirêj derbas dibe, beriya ku derkevin hewşê, ew ê girtî li Reşîdo dipirse, jê re dibêjin ew ê ku tu pê re pevçûyî, yekî çiyayî ye.

Hesenê Hemû dipirse li yê girtî, jê re dibêjin ew Şero ye, şeroyê binav û deng, li sernserî Qamişlo, teşqelçî û serseriyê bêhempa ye.

Hesen ji Reşîdo re dibêje, kuro te mala me xerab kir ma te nedît ji bilî Şero pê ve ku ti pê re pevbiçe?!

Reşîdo dibêje ez Şero mero nas nakim, yê destê xwe dirêjke ez ê jê re bişkînim!

Di dema ku wan derdixin hewşê, Hesen û Reşîdo yek rast berê xwe didin dîwarkî û pişta xwe didinê de, ji ber ew nizanin bê ji kîja aliyî ve wê erîşî wan bê te kirin.

Şero derdikeve û yek rast berê xwe didê Reşîdo û Hesen, herdû dikevin amedekariyê de, Lê Şero dema ku nêzîk dibe, ji wan re dibêje: Bibûrin min nizanîbû hûn xelkê meyî vê Torê ne, we bigota da me ti derb bêhemdî xwe li hev nexista, Reşîdo dibêje: wişt de bera em li çolê ba ,te yî virevira kevira dîtibana.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Piştî Kobanî û Hesekê Jî ... Em Hîn Li Vir In

kurdî

Xweş e

Jîdarî	حيوي
Jixweber	طوعي
Karsipartî	مفوضية
Kirdar –rewişt	سلوك, تصرّف
Kogeh – embar	مخزن
Koja	قضت
Lêkdan	صدمة
Lêpirsîn	محاسبة
Lihevhatin	اتفاق
Lihevkirin - Serastkirin	تسوية
Melbend	منتدى
Meredan	اشتراط
Neberaqile	غير معقول

Bacanê sor ‘Temate’ dermanê 14 nexweşiyane

Bacanên sor hêşînhatek ji malbata bacanên reş (obergîn) tê hesibandin. Navtenga wê bi tîrane radibe, paşê gelek çiq jê diçin. Bejna wê heta sê mitroyan jî bilind dibe. Navteng û tayên çiqan bi sitirî ye. Lê stirîyên wê nerm in, rengê çiq û navtengê kesk in. Belgên wê keskên xetxetî û yên mezin teriqîne.

Rûyê belgên wê yên derve keskê biriqok,yê hindur mat in û bêhnek gelek xweş jê tê. Kulîlkên wê zer in, dema ew kulîlk diweşîn li cihê wan dikakek (zerzewat - fêqî) çêdibe. Ji wê fêqîyê re bacanên sor tê gotin. Ew fêqî berê kesk, pêre zer, dawîyê jî sor dibe.

Di nava dikakê de dindik (sîsik-tov-bizir) hene. Ew tov tê hilanîn. Berê di nav qutîkan de tê çandin. Li wir dibe şitil, paşê ew şitil di nava zevî û baxçan de tê çandin. Çawa hinek cûreyên kulîlkan bi şev vedibin, bacan jî dikakek şevger e. Gelek cûreyên wê hene. Wek bacanên sor-spî- zer û naha jî yên reş û binefşî (mor) peyda bûne. Bacan bi gelemperî jibo xwarinê û nav seletan tê çandin û nirxa wê ya di tibbê de gelek bilind e.

Welat û Dîrok: Welatê bacanên sor Meksîka, Perû û Bolîvya ye. Berê li çolê yên zer hatin dîtin.Dîroka wê baş nayê zanîn, lê 1000 sal e ku li Meksîka, Bolîvya û Perûyê çandinîya wê tê kirin û jibo xwarin, selete û derman tê xebitandin.

Piştî kefşkirina Amerîkayê, ji alîyê Kirîstof Kolomb ve bi gemîyan Ewropîyan anîne welatên xwe. Îtalyanîyan ji ber rengê wê yê zer bacan wek “ sêva zêrîn bi nav dikirin.” Îngilîzan heta sala 1900 an wek “sêva eşqê “ bi nav dikirin. Bacanên sor ji alîyê Ewropîyan ve ber bi deverên din çûye. Îngilizan bi xwe re birine Hîndistanê.

Modela kurd a Hollywoodê: Sazan Barzanî

Keça kurd Sazan Barzanî ku li amerîkayê dijî û karê modeltiya cilûbergan dike, bi karê xwe niha gelekî navdar bûye û yekemîn keça kurd e ku di wî warî de di asta amrîka û Hollywoodê de deng bide û ber bi stêrkbûn di Hollywoodê de biçe.

Sazan Barzanî keçka kurd a xelkê Başûrê Kurdistanê ye ku li bajarê Nashvil a Amerîkayê jidayik bûye û her li wî welatî jî dijî. Ew niha pêngavan ber bi wê yekê dihavêje, ku di warê modelê de bibe stêrek navdar û roj bi roj jî pitir bi navûdeng dibe.

Sazan di sala 1989 de li Amerîkayê jidayik bûye û bi xwe dibêje, ku di nava malbateke Rojhilata Navîn de jidayik bûye û malbata wan li Kurdistanê gelekî navdar e.

Sazan Barzanî heyamek berî niha hevpeyvînek kurt bi Rûdawê re kir. Wê demê ew mijûlî projeyeke nimayişkariyê li Amerîkayê bû û derfet nebû bi dirêjî behsa kar û projeyên xwe bike.

Jibilî wê yekê, wê girêbestek bi şîreketekê re hebû ku li gor wê girêbestê, wê nedikarî ji medyayan re biaxive. Piştre wê zewac kir û demekê jî bi wê yekê mijûl bû. Sazan Barzanî bi mere xwe yê amerîkî re hevya hingivîn a xwe li vajarê Venîs a Îtalyayê derbas kir û piştî ku vergeriya amerîkayê, bersiva hemû pirsiyarên Rûdawê da. rûdaw

Zûbêjj

Mamik???

- Her roj diçe dibistanê,lê tiştek nizane.
- Hım Hıma lı ber çema, ne gur dıxwe ne dız dıbe.
- Ga orî,pişkul fırî.

Bersiva hejmara bûrî :Tiving – Sabûn – Dendik –

Hejmara bûrî

7	5	9	1	8	2	4	6	3
8	1	6	3	4	7	5	2	9
2	3	4	5	6	9	7	1	8
9	6	7	2	5	7	3	4	1
1	4	8	7	3	6	2	9	5
3	2	5	9	1	4	6	8	7
5	8	2	6	7	1	9	3	4
4	9	3	8	2	5	1	7	6
6	7	1	4	9	3	8	5	2

Hejmara bûrî

H	E	S	E	K	Ê

Pend û şîretên kurdî

Ê tirsonek temen dirêj in, ne min gotiye kalepîr dibêjin .

Mêrxas çûne hawara, bizdok ketin kewara .

Mêrxas çûne talan û êrîşa, bizdok ketin pişt kulîn û dergûşa.

Destê tirsonek naçe nav paxilan

Kesê ne li malekê nizane bi hewalekê -

Kes nabêje bavê te çawa ye, hemû dibên diya te çawa ye

Piştî poşmaniyê girî bê sûde ye

Hejmara bûrî

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	L	A	W	E	N		K	
2	A	R		S	A	R	î	N
3	C	I		A	J		Z	Û
4	î	C	E	R	î	G	ê	C
5	N		B	I	K	I	N	
6		R	E	D		H		T
7	M	ê	R		T	A	R	Î
8	A	X	E	F	T		R	R